

**Ji ber faşîzma Fars  
bi hezaran mamosteyên  
Kurd ji kar têne dûrxistin**

»»» R:7



**Berxwedana  
PDKI azadî  
û jîyan e**

»»» R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd  
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

**Dewra dawiyê**

»»» R:2



**Bo yekem car  
Kurd bûn ku Xomêynî  
têk şikandin**

»»» R:5



**Şoreşa gelên Îranê  
wê serkeve**

»»» R:6



Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne [www.kurdistanmedia.com/kurdî](http://www.kurdistanmedia.com/kurdî)  
[www.agirimedia.org](http://www.agirimedia.org) Hejmar (362) 21-11-2019 Buha (1000) Tûmen

## Li bajarên serhildan e

**R**oja 24-ê Xezelw-  
Rerê Şevra Bilind  
ya Hevahengiya Aborî  
ya karbideştên her sê  
dezgehên Yasadanan û  
Birêveberî û Dadwerî  
a rejîma Tehranê nirxa  
benzîna di di Îranê de  
weha ragehand: “Ben-  
zîna asayî bi awayê  
pişk-pişk (sehmiye), her  
lîtrek bi 1500 Tûmenî,  
benzîna asayî û azad  
her lîtrek 3 hezar Tû-  
men û benzîna super  
her lîtrek 3500 Tûmen.



Piştî belavbûna vê  
nûçeyê û di yekem  
karvedanê de, xelk  
li bajarê Ehwazê  
de, nerazîbûna xwe  
nîşan dan, û riji-  
yane ser şeqaman.  
Gellek nekêşa ku  
xwenîşander li bajarên  
curbicur ên Îranê ên  
wekî: Tehran, Îs-  
fehan, Kerec, Tewrêz,  
Şîraz, Bêhbehan,  
Ehwaz û Mahşehr,  
Zencan û ...hwd  
û herweha bajarên  
Kurdiştana Rojhilat,  
wekî Sine, Merîwan,  
Ciwanro, Kirmaşan,  
Kamyaran, Urmiye,  
Bokan, Îlam û Seqiz,  
daketin ser şeqaman,  
û li dijî sistema ha-  
kim û biryarên wê  
diruşm dan. Herçend  
ku di destpêkê de  
nerazîbûn bi awayê  
aram bûn, lê gellek  
nekêşa ku serkutkarên  
rejîmê berbûne canê  
hevvelatîyên nerazî û  
di heyama çend rojan

de bi dehan kesî şehîd kirin û sedan kes jî birîndar û çend hezar kes jî deşt-  
biser kirin.

Bi pêkhatina vê rewşê xwenîşander siloganên wan tenê di giranbûna ben-  
zîna de berteng nebû, û radîkaltir ji berê rêberiya rejîmê û wilayeta feqîh û  
bi giştî rejîma zal kirin armanc, ku ew yek nîşana kerb û kîna pendavbûyî ya  
xelkê bêzarbûyî ê Îran û Kurdiştanê ye.

Li gora ragehandina medyayên rejîma Îranê bixwe û medyayê nêzîkî  
Spaha terorîstî ya Pasdaran li pitir ji 100 bajar û herêmên Îran û Kurdiştanê  
de meş bi rê ve çûne, û heya niha berdewam dikin, herweha dehan bank û  
pompbenzîn û navendên hikûmetî û tirombêlên serkutkerên rejîmê ji aliyê  
xelkê ve hatine şewitandin.  
Li Kurdiştanê cudatir ji hemû herêmên din ên Îranê rewş aloztir e, û ser-  
kutkarên rejîmê bi awayekî herî tund xelkê nerazî serkut dikin, û li bajarên  
Merîwan, Ciwanro, Sine, Kirmaşan û Bokan û ...hwd, bi dehan kesî şehîd  
bûne, û dehan kesên din jî birîndar bûne.

Navê hinek ji şehîdên xwenîşandanan ew in: Osman Nadirî, Bêhrûz Me-  
likî li Merîwanê, Mobîn Ebdullahî û Kawe Mihemedî û Îbrahîm Muradî li  
Ciwanro, û çend hevvelatîyên din ku nasnameya wan nerohn e. Hevdem  
zarokekî temen 13 salî bi navê Hîwa Nadirî xelkê Merîwanê û çendîn kesên  
din bi tundî hatin birîndarkirin.

Ew meş di demekê de bi rê ve diçin ku Xamineyî gef li xelkê xwariye, û  
piştevanî ji girankirina benzîna kiriye, di heman demê de nerazî wekî tîkder  
û şerût (fitneçî û şerxwaz) bi nav kirine, ku li dijî “înkilab”ê ne, û dibe bê  
serkutkirin.

Wezaretê Îtîla'atê jî di daxuyaniyekê de ragehand: “serkutkirina şerxwazan  
erk û wezîfeya me ye”.

Li gora amarên fermî  
nêzî hezar kesî di  
sertaserê Îranê de  
hatine detsbiserkirin  
û 150 bank û naven-  
dên hikûmetî hatine  
şewitandin û sedan  
kes jî birîndar bûne, û  
bi dehan kesî jî ha-  
tine kuştin. Di heman  
demê de dehan serkut-  
kar jî hatine kuştin û  
birîndarkirin.

Di vê navberê de  
Navenda Hevkariya  
Hizbên Kurdiştana  
Îranê piştevanî ji van  
xwenîşandanan kiriye  
û ew nerazîbûna xelkê  
bi rewşa daye zanîn.  
PDKÎ di çendîn dax-  
uyaniyan de piştevanî  
ji dengê mafxwaziya  
xelkê kiriye, û rêz-  
dar Miştefa Hicrî  
lêpirsyarê giştî ê PDKÎ  
daxwaz ji xelkê kiriye  
ku meşa xwe ya ner-  
azîbûnê bidomînin,  
navbirî ragehandiye:  
“Hemû xelkê cîhanê  
piştevanê we ye, û  
dengê me digel dengê  
we ye û dilê me li cem  
we ye”.

Cuda ji van helwestan  
serokên çendîn we-  
latan û herweha çendîn  
rêkxirawên cîhanî  
bi hûrî şopandinê  
bo rewşa Îranê dikin  
û tevî eşkerekiirna  
piştevaniya xwe ji  
xwenîşanderan dax-  
waz ji Komara Îslamî  
kirine ku dawiyê bi  
rewşa sepandî binin.

## Sergotar

## Dewra dawiyê

N: Kerîm Perwîzî

Renge ew raveya min şaş be, renga heya radeyekê jî bibe raştî, lê min jêve ye ku Wilayeta Feqîh di Kurdiştanê de wê bikeve qedeman, û Kurdiştan wê bibe çepera berxwedana li dijî vê rejîma hov.

Di destwajeyên siyasî de têgehek heye, bi navê “tor-mîdor”, ku hekî ez bi şaş jê tenegehîştibim, bi wateya dewrlêdan û li dewra xwe zivîrînê ye. Bi vê wateyê ku kiryar û îdarekirina hikûmetan wekî li dewra xwe zivîrîna di nava bazineyekê de ye, ku qonax bi qonax derbaz dikin û dewreke weha di nava hemû deshilatên piştî herifîna sîstemekê û pêkhatina sîstemeke din tê dîtin. Ya ku di qonaxên yek li pey yekê yê rejîma Wilayeta Feqîh de tê dîtin, destpêkê Xomêynî ji Parîsê anîn û kirin rêberê şoreşa gelên Îranê, û ew şoreş jî xelkê hate dizîn. Di dewra yekem ya bazineya dewranên deshilatdariya Wilayeta Feqîhî di Îranê de êrîş kirin ser Kurdiştanê û piştê hemû hêzên nahevterîb li derdora deshilatê derxistin, û hêdî-hêdî teknokrat jî dane aliyekî.

Di dewra duyem de jî şer digel cîhanê kirin û aboriya Îranê wêran kirin, û deshilata navxweyî yekdeşt kirin, di serdema Xomêynî û Mûsewî û serokê meclisa Refsencanî.

Di dewra duyem de şer digel cîhanê kirin û aboriya Îranê wêran kirin û deshilata navxweyî yekdeşt kirin.

Li dewra sêyem de piştî bidawîhatina şer, bas ji “î’tiyad”ê anîne ber bas, û di qonaxa çarem de û di lûtkeya deshilatê de bas ji reform û diyaloga şariştaniyetan bû, û dewra pêncem paşê jî vebûna rewşa navxweyî û

## Mîstefa Hicrî daxwaz ji xelkê kir ku xwenîşandanên xwe bidomînin

**L**êpirsiyarê Giştî yê PDKÎ, di peyamekê de daxwaz ji xelkê kir ku bi hemû qat û taxên xwe ve xwenîşandanên xwe bidomînin.

Peyam bi wî awayî ye: Peyama “Mîstefa Hicrî”, Lêpirsiyarê Giştî yê PDKÎ, li derheq xwenîşandanên Rojhilatê Kurdiştanê,

Hevwelatîyên xebatkar li Rojhilatê Kurdiştanê

Dengê bilind ê bêzariya we ji rejîma dijî gelî ya komara Îslamî ku hawarekî berheqe, tevlî dengê xelkê bi hirs ê Îranê, bû serdêra nûçeyên hemû cîhanê.

Her çî qas ku guhên deshilatdarên rejîma dijî gelî ya komara Îslamî li heyamê wan 40 salên derbasbûyî de, di hember daxwazên we de ker bûye, û di gotinên wan de xûya dike ku heya niha jî, dengê we nebihîstine, bi wî halî jî, bi yekrêzî û yekdengî ve, jin û mêr, ji hemû tax û qatên xwe ve, mil bi milê hev, li girevgirtin û meşên xwe berdewam bin û li ser daxwazên xwe havar bikin.

Rica dikim di wê berxwedanê de, xwe ji tunûtîjîyê biparêzin û bi awayekî aştîxwazane, xebata xwe bidomînin, ji ber ku ti hêcetek nekevê deşt rejîmê bo tepe-



serî û zilm û zora zêdetir li ser xelkê.

Hemû xelkê cîhanê piştevanê we ye, dengê me digel dengê we ye û dilê me bal we ye.

Ez sersaxiyê ji malbatên Şehîdên wê berxwedanê dikim û hîvîdarim birînen birîndaran jî baş bin

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Lêpirsiyarê Giştî

Mîstefa Hicrî

26`ê Xezelwera 1398`an

17`ê Çirriya paşîna 2019`an

dewra şeşem vejeriyana bo gotara bi nav “î’tidal” û dewra heftem cardin têkçûyîna digel hemû cîhanê û wêrankirina aborî û niha jî cardin vêdedana hemû ewên ku di van salan de di warê gehandina Îrana ferhengî bi asta îdeolojîyê alîkarî kirin, heya ku xwîna xelkê bimijin, û cardin meş û nerazî ya hemû tex û qatan deşt pê kiriye.

Di vê dewrlêdan û geriyana di nava bazineya deshilatdariya Wilayeta Feqîh de ew rejîma vejeriyaye ser xala destpêkê, û dewra yekem ku dibe dewra dawiyê û gera encamê! Piştî hatina Xomêynî ji serkutkirina Kurdiştanê, serkuta neteweyên blindeşt ên wekî Tirkemenan û hwd... deşt pê kir, û di vê qonaxê de jî, li serlêjîyê de cardin deşt kiriye bi serkutkirina hovane ya Kurdan û neteweyên belengaz bi vê cudahiyê ve ku vê carê di hilkişyana Kurdiştanê û herifîna rejîmê de gihîştne hevdu.

Vê carê Komara Îslamî tu pîvan û stûneke wê nemaye û bona mana xwe û wekî kesekî ku di nava gomavê de bixendiye, deşt davêje hemû pûşekê, û ji tirsê mirinê jî, merg û nemanê ji xelkê re bi diyarî tîne.

Ew hemû xwîna ku li ser şeşamên bajarên Kurdiştan û Îranê de dirijîne, di warê hêz û deshilatdariyê de nine, berevajî wek kesekî tirsinok ku di dolekê de û di tarîtiyê de asê maye, û hemû dar û kevir lê dibin bi leşkerê dijmin, Xamineyî jî niha hawar dike ku hemû ew xelk leşkerê dijmin bûn, û ji tirsê mirinê deşt avêtine xwekujîyê.

Mixabin ku xebat di Îranê de xwîne dixwaze û qurbaniyeke zaf hatiye dan, lê di van dawiyane de gera xebata li dijî şemkariyê de, Kurdiştan e ku navê wê di cîhanê de deng vedide, û renga her bi deştê Kurdekî jî kinder bikeve stûyê Xamineyî.

## Partiya Demokrat a Kurdiştana Îran: Em piştevaniyê ji xwenîşandana xelkê dikin



**P**artiya Demokrat a Kurdiştana Îranê di daxuyaniyekê de, tevî şermezarkirina siyaseta rejîmê li derheq givaş xîstina zêdetir bo ser xelkê, piştevaniya xwe li vê bizava nerazîbûna xelkê bi her awayekî ku heye, dide xuyakirin.

Daxuyani bi wî awayî ye:

Daxuyaniya Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê, li derheq nerizayeti nîşandana xelkê li derheq bilindkirina nirxa Benzîne

Hewelatîyên rêzdar

Civatên xelkê jêr sitem ên Îranê

Civatên xweragire xelkê Kurdiştanê

Rejîma komara Îslamî ya Îranê ku di bin barê giranê givaşên aborî de ye, û bona derkevtina ji vê rewşê, çi rêkekî din ji bilî givaş anîna zêdetir bo ser xelkê jêre nemaye.

Di vê derheqê de û di çarçova givaşxîstina zêdetir bo ser xelkê, nişkêve û bi bê ti rûnkirinekê li pêşwexet de, ragihand ku, di roja 24`ê meha Xezelwera 1398`an de, dana Benzîne sehmiye bendî dîke û hem %50 ji nirxa benzîna sehmiyeyî anku li 1000 tûmen bo 1500 tûmend zêde dîke û nirxa benzîna azad jî heta 3 hêndê yanî 1000 tûmen bo 3000 tûmen zêde dîke.

Ew biryare li nişkêve û di demekê de hate ragihandin ku, çend rojan berî hingê, demûdezgehên peywendîdar ên rejîmê, sehmiye bendî û bilindkirina nirxa Benzîne, wekî dengo û dûr ji raştiyê hesibandibûn û bi tewawî red kiribûn.

Ew biryara rejîmê bi qasekê neserrast û newekhev bû digel jiyan û derbas kirina xelkê, ku dezgehên ewlehiyê rejîmê seh bi egera nerizayetiya xelkê kiribûn, her lewma jî ji êvara roja Îne ragihandin ku ew biryara bê ti pirsgerêkekê hatiye cîbicîkirin.

Ew biryare ku nişkêve ragihandin, bona bi xafil girtina xelkê bû daku bi ser karekê de bikevin ku hatiye encam danê. Lê bi wî halî jî dengê nerazîbûna xelkê bilind bû, û li piraniya bajaran xwenîşandan hatine kirin û

wisa têtê xûya kirin ku hemû bajarên Îranê bigre. Hêzên rejîmê ku li zaf ci-hên bajaran cih girtibûn, xelk dane ber desrêja gullan ku heta niha hejmarek ji xwenîşandera li Îran û Kurdiştanê canê xwe ji dest dane, û dehan kesên din jî birîndar bûne ku tepeserî herwisa dirêjî heye.

Hesen Rûhan Serkomarê rejîmê, her wekî her car, bi mebesta xapandina xelkê û berahîk girtin ji xwenîşandana nerizayetiyan ragihan ku, dahata bilind kirina nirxa Benzîne, dê bi ser %75 ji xelkê belengazê Îranê de bête parkirin û ew biryare pêwendî bi qerebûkirina kêma anîna bûdca dewletê nîne. Eve jî di demekê de ye ku, berpîrsên rejîmê berê jî ragihandibûn ku, bona tejkirina kêmiya bûdcê di cihê pişt girêdan bi dahata neftê, emê pişt bi dahata navxweyî girêbidin û ewajî bi kiryar bi vê wateyê têtê ku givaşa zêdetir bêxne ser xelkê, ku bilind kirina nirxa Benzîne yek ji wan siyasetaneye.

Bilindkirina nirxa Benzîne tenê givaşeke yekalî û yek kalayî bo ser jiyan û derbas kirina xelkê nîne, belkî komek bandorên nerênî bi dû xwe de tine ku jiyan xelkê ber bi xirabiyê we dibe û dibe sebebê bilind bûna pareke din ji hewcehiyên xelkê jî. Wekî nirxa emirazên

hatûçonê û ew tiştên ku bi sedema bikaranîna Benzîne ve têne berhem anîn. Xelkê bêzarbûyî û belengaz, gelek baş ji encama vê biryara rejîmê têtê geheştine û nerizayetiya wan helwêsteke li cihê xwe daye, çimkî dizanin hekî li hember vê givaşa nû ya rejîmê de bê deng bin, rejîm dê givaşan û bilind kirina zaf nîrxên din de jî dê mukur tir be.

Rêkxîstina nerizayetiyan û bilind kirina dengê nerazîbûna seranserî, kite rêka berahîk girtina bi rejîmê bo givaş xîstina ser xelkê ye. Bi berçaw girtina vê raştiyê, Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê, tevî şermezarkirina siyaseta rejîmê li derheq givaş xîstina zêdetir bo ser xelkê, piştevanî û piştgiriya xwe li vê meşa nerizayetiya xelkê bi her awayê heye dide xuyakirin û hîvîdare ew hereketa destpêkek be bona serkevtina îrada xelkê bi ser rejîma komara Îslamî de. Hevdem hevxiyê xwe digel malbatên qurbanîyên vê meşê nîşan dide û çê bûna birîndaran jî bi hîvî dixwaze.

Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê

Navenda Siyasî

26`ê Xezelwera 1398`an

17`ê Çirriya paşîna 2019`an

## Berdevkê PDKÎ: Em vê hereketa xelkê bi rewa dizanin

**B**rdevkê PDKÎ ragihand ku, em piştevaniya vê hereketa xelkê dikin û ev biryara rejîmê ti core wekhevîyek digel jiyan û derbasbûna xelkê nîne.

“Hesen Şerefi, Berdevkê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê di hevpeyvînekê de digel kanala “TISHK tv” basa wê yekê kiriye: “Em piştevaniyê û piştgiriya li xwenîşandana xelkê ku di piraniya bajaran de heye dikin”.


Berdevkê PDKÎ sersaxiya PDKÎ bi malbatên şehîdên wê hereketa re ragihand û hêviya başbûnê bo birîndarên wê hereketa kir.

“Şerefi” ragihand: “Gelek eşkereye hekî xelkê nerizayetiyan xwe nîşan nedabana, rejîmê bo givaş xîstina zêdetir bo ser xelkê berdewam dibû”.

Nabirî di dawîya axavtîne xwe de cext kiriye, em hêvîdarin ku ev hereketa, hereketek be ku îradeya xelkê bi ser nefsa wê rejîmê de zal



## Qeyûmên Ataturk



N: Cemal Resûl Dinxe

Nêzî yek salî ye ku dewleta Tirkîyê bi deşhilatdariya (AKP)ê ku Recep Teyîb Erdoxan serokayetiya wê dike, pîlanên û li dijî Bakûrê Kurdistanê dadirêje. Eva salek e ku Erdoxan bo dijayetîkirin digel deşhilata Partiya (HDP)ê, hemû rêyekê dide ber xwe.

Di demsala Bihara îsal de ku, hilbijartina şaredariyên Tirkîyê bi rê ve çû, Partiya Erdoxan li çendîn bajarên girîng ku yek ji wan Îstanbûl bû, deng neanî. Di Bakûrê Kurdistanê jî bi piropagendekirina li dijî partiyên karî li çend bajarên de deng bîne. Lê piştî wan hilbijartinan, partiya Erdoxan raştî şikestê hat ku nekarî wê şikestê veşêre, ew jî piştevaniya xelkê Bakûrê Kurdistanê ji partiyên yasayî ên xwe bû. Bo mînak dema ku Erdoxan basa wê yekê kir ku, li çendîn bajarên de dúbare dangan dihejmêre, HDP-ê bi awayekî tund helwestê girt. Helwestek ku Erdoxan naçar kir ku li pey hilbijartinan sertaserî bikeve, û ev biryare jî raştî



nerizayetiyan giştî hat. Xwezayî ye ku xebatên her yek ji partiyên Kurdî li her yek ji parên Kurdistanê, pêka çand û rewşa siyasî ya wan welatên ku ew partiyane xebatê bo dikin, formê bi xwe ve digre. Di vir de axaftineke Dr. Qasimlo em bi bîr tînin ku dibêje: “Ew deşhilata navendî ye ku cureyên xebat bo me diyarî dikin”.

Ew gotinê wê watayê, heta ku deşhilata navendî tundûtîj be, asayî ye ku xebata partiyên dijberê wî jî bi eynî şêwe dibe, berevajî heta dewleta navendî rêya mentiqê bigre ber xwe, xebata partiyên wê jî mentiqîtir û bicî dibe. Erdoxan bi siyaseta xwe da xuyakirin ku, HDP û partiyên din yên Bakûrê Kurdistanê kîjan rêyê hilbijêrin. Siyaseta Erdoxan ya givaşê bi givaşê hatiye bersivdan.

HDP niha gihîştîye wê qina`etê ku li parlemana Tirkîyê vekêşe. Yen jî li Dadgeha Bilind a wî welatî de li

dijî Erdoxan şikayetê bike. Belkî xwîner wisa bîr bike, ku îca HDP hêzeke wisa nîne ku bi gotina wî bikin?! Lê du helwestên HDPê, em dikarin di axavtinên Erdoxan de bibînin, ku Erdoxan du helwest li dijî serweriya Tirkîyê hesabandine, ku gotina HDP mijûlî hiloşandina yasaya bingehîn e.

Ew gotine basa wê hindê dike ku pêgeha partiyên di siyaseta Tirkîyê de heya çiqasî ye? Ji aliyekê din ve jî, Erdoxan deşt avêtiye danîna qeyûman. Li deştpekê bila em basa wê hindê bikin ku qeyûm ji çi edebiyatekê ve hatiye?! Di edebiyata siyasî ya Tirkîyê de, ku ji împiratoriya Osmanî ve bi mîrat hatiye wergirtin, dema ku dixwazin birêveberekî-ê bo bajarekî yan jî bo cihekî diyarî bikin, Turk jê re dibêjin “qeyûm” wate serperêşt.

Qeyûmdanîna Erdoxan di bajarên Kurdistanê Tirkîyê de, bi wê watayê ye ku di wî

bajarî de kesekê lêhatî bo wê postê nîne. Ew jî di halekî de ye ku, wî xelkî partiyên xwe hene, ku wate biryare Erdoxan li Bakûrê Kurdistanê rewa nîne û bi zorî qeyûmên xwe dadinê.

Lê armanca Erdoxan li danîna qeyûm çî ye? Tev partiyên Tirkîyê bi taybetî (MHP), (CHP) û (IYI Partî) tirsan wan ji wê yekê nîne ku partiyeke Kurdî deşhilata şaredariyan bi deşt ve bigre, lê ew tirsan wan ji wê yekê ye ku, ew partiyane bîra nasîyonalîstî berfireh bikin, û ew bîre jî ku li dijî bîrokeya Ataturk e.

Deşhilatdarên Tirkîyê ku dibêjin Tirkîye yek netewe ye, bi xwe baş dizanin ku ew gotina wan tu raştîyekê de tune ye, çimkî berpirsên Tirkîyê bixwe dibêjin, em li dijî her bîrokeye nasîyonalîstî ne.

Danana qeyûman di bajarên Kurdakincî de ji aliyê Erdoxan ve bi wê mebestê ye ku, pîrsa Kurdî wê para Kurdistanê de, tenê di mijara wekî aborî û civakî de bi dawî bîne.

Niha pîrsa Kurd li Bakûrê Kurdistanê, tenê bi wan mijaran dawî pê nayê, belkî arîşeya Erdoxan niha mezintir e ji wê mijarê ku bas dike. Hewlên Tirkîyê bo wê yekê ne ku aliyê kêm rewta nasîyonalîstî ya Kurd li Bakûrê Kurdistanê aşteng bike, da ku zû serkevtinan bi deşt ve nehînin.

## Xwenîşandanên di bajarê Merîwanê de çendîn kuştî û birîndar li pey xwe anîn

**L**i berdewamiya xwenîşandan û nerizayetiyan xelkê Kurdistanê li dijî bilindbûna nirxa benzîne, çendîn welatî bi sedema teqeya rasteraşt a hêzên Spaha Pasdaran a terorîst hatine kuştin.

Pêka nûçeya ku gihîştîye malpera “Kurdistanmedia”yê, îro şemî rêketa 25`ê Xezelwerê, li encama xwenîşandan, li bajarên Kurdistanê li dijî rejîma Îranê, çendîn welatî li bajarê Merîwanê, bi deştê

hêzên leşkerî yên rejîma Îranê hatine kuştin û birîndar bûn.

Di wê xwenîşandanê de, “Osman Nadirî” xelkê “Cûcesazî” a ser bi bajarê Merîwanê, û çendî welatîyê din jî, ku nasnameya wan nexûyaye, hatine kuştin.

Hevdem zarokêkî temen 13 salî ê binavê “Hîwa Nadirî” û 2 kesê din jî, yên bi navê “Şaho welîdî”, û “Mêhran” bi dijwarî hatine birîndar kirin.

Banka Ensar ku ser bi Spaha Pasdaran a terorîste û bankên “Milî û Sadirat” jî, hatine wêrankirin.

Asta birîndar û kuştîyan zêdeye, lê nasnameya wan nexûyaye.



Herwisa pombenzîna “Xawerî” û “Kawe Konepoşî”, naskirî bi “Kawe Şêx Bira” ku endamê Spaha Pasdaranê di bajarê Merîwanê de, agir berdanê.

Bo yekem car Kurd bûn ku Xomêynî têk şikandin



N: Cemal Fethî

Deshilata rejîma Îslamiya Îranê deshilat û sîstemek e ku hertim xwaştiye ku bi tirs û dilekutê ve rewayiya xwe biselmîne, û ji bo vê armancê her ji destpêkê ve tenê take riya ku hilbijartiyê, serkut û bêdengkirina dijber û neraziyan bûye, jiber ku avakerê vê sîstemê û deshilatê wate Xomêynî kesek bûye ku çî di jiyana taybetî ya xwe de, û çî di jiyana siyasî de, bi çavekî sivik li dijberên xwe nihêriye, û yek ji taybetmendiyên kesî ên wî kesî ku di rewşeke tundajo de hatibû perwerdekirin ew bû ku hertim rikeber û hemberên xwe ji riya şer ve neçar bi serî-tewandinê kiriye, û ew taybetmendiya nebaş jî piştî vê ku deshilata Îranê bi dest ve digre, xwe nişan dide, û her ji destpêkê ve dest bi vêdedana wan kes û aliyan kir ku stûxwar û guhdarê wî nebûn.

Xomêynî bi bireke tund ya Îslama siyasî ya şî'etiyê û derûneke pirr ji kerb û kîn û herweha xwe bi mezinzanîn û pozbilindî wekî tilismekê, berevajî xwestek û daxwazi-yên xelkê, bera şoreşê dide aliyê deshilatekê ku amadey-



iya tu cure bîr û rayeke cuda tê de nahê dîtin, û tenê birek ku li cem Xomêynî û hevhez-rên wê tê qebûlkirin bîr û hizra Îslama Wilayeta Feqîhî ye ku Xomêynî tê de nûnerê xwedê tê nîşandan û hemû takên civakê jî pezê li ber destên Xomêynî ne.

Yek ji wan alî û neteweyên ku her ji destpêkê ve li dijî Xomêynî û siyasatên vê rejîmê sekinî, neteweya Kurd bû ku PDKÎ nûnerê berçav e vê neteweyê li dijberkirina rejîma Îranê bûye, lewra Xomêynî ku bawerî bi demokrasî û azadiyê nebû, PDKÎ û şexsê Dr. Qasimlo ku nûnerê berçav e daxwazi-yên Kurd bû wekî mohreyê destê welatên Rojavayî dihesiband, û di rêkewta 28-ê Gelawêja 1358-an de fermana şerê sertaserî li jêr navê fermana cîhadê bo Kurdiştanê derdike, jiber ku di baweriya Xomêynî û rejîma Îslamî ya Îranê de Kurd bi giştî û PDKÎ bi taybetî kafir in, û kuştina Kurd wekî yek ji ferzên Îslamê tê hesibandin.

PDKÎ serbarê vê ku hizbeke aştxwaz bû, lê tu demekê ku Spaha reş û ehrîmen a Xomeynî êrîşên xwe ber bi Kurdiştanê dest pê kirin, bi ew qasê heştkirina bi berpirsayetîkirinê ve bergirî ji Kurdiştan û neteweya Kurd kir û digel vê ku di warê çek û teqemwniyan û hêza leşkerî û locistîkî ve şerekî neberamber bû, karî di vî şerî de ku sê mehan dom kir şikesteke tal bi serbazên cehl û nezaniyê bide tamkirin. Xomêynî û hevbîrên wê ku wisa danîbûn ku di vî şerî de dawiyê bi pirsra Kurd tînin û Kurd stûxwar û teslîmê xwe dikin, bi tamkirina şikesteke tal ya weha, tirsinokî û rûyê xwe ê rastîn eşkere kirin û daxwaza lêborînê li neteweya Kurd kirin, ku gotina nûçe û raporên li ser Kurd bi şaşî gihîştine destên Xomêynî, lê ew taktîka rejîmê tirseke xapînok bû ku di rastî de dixwaştin bo şerekî berfirehtir xwe amade bikin, lewra li 26-ê Xezelwera 1358-an de peyama ragirtina şer ji aliyê Xomêynî

ve hate ragehandin.

PDKÎ ku di hemberî neteweya Kurd de xwe berpirsyar dihesibînan, bersiva erênî da peyama Xomêynî û pêşwazî ji ragirtina şer û agirbesê kir, ku di rastî de ew yek vedigere ser çend sedeman. Yekem eva ku her di bingeha xwe de PDKÎ bawerî bi vê hebû ku pirsra Kurd dibe ji riya aştiyane ve bê çareserkirin, ne ji riya şer ve.

Ya duyem eva ye ku herçend pêşmerge di eniyên şer de bi ew qasê qehremantî ve bergirî ji Kurdiştanê kirin, lê Kurdiştan ketibû nav dor-pêçeke zêde de. Herweha li Kurdiştanê demsala serma û befr û baranê hêdî-hêdî dest pê dikir, û xelk li warê aborî û madeyên xwarinê dikevin nava tengaviyê de.

Pêşwaziya PDKÎ ji peyama ragirtina şer, di demekê de ku pişka herî zêde ya eniyên şer jî di kontrola pêşmergeyên hizbê de bû, herçend karekî aştxwazane û siyasiyane bû, lê ji aliyê hindê aliyan ve wekî lihevkerin û "lebêyk"gotina bi Xomeynî tê hesibandin, lê hekî rewşa wê demê ya Kurdiştan û herweha aştî xweragirî û di meydanê de mana PDKÎ di eniyên şer de li berçav bigrin weha boxtanek li PDKÎ û şexsê Dr. Qasimlo nişana kerb û kîneke pendavbûyî ye ku tu belge û lojîkeke siyasî û mirovî nine.

Nasnameya du kesan ji kuştîyên bajarê Merîwan û Ciwanro hate eşkerekirin

**N**asnama du welatiyên nerazî yên xelkê bajarê Merîwan û Ciwanro ku di kombûna nerizayetiyan de, bi teqeya hêzên hikûmetê canê xwe ji det dabûn hate eşkerekirin.

Pêka rapora ku gihîştîye Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, roja Şemî 25`ê Xezelwerê, "Bêhroz Melekî" kurê Haşim û xelkê gundê Tengîser a ser bi devera Javero ya bajarê Sine,

û rûniştîyê "Kanî Dînar" a ser bi bajrê Merîwanê di nav xwenîşanderan de bi sedema gullereşandina hêzên hikûmetê, bi dijwarî hatibû birîndarkirin, û bi sedema kûrbûna birîna wî, navbirî canê xwe ji dest da.

Ew welatiyê Kurd berê jî, endamê Partiya Demokrat a Kurdiştana Îranê bû, û heya niha termê wî radeştê malbata wî nekirine. Çavkaniyeke aghedar di

nexweşxaneyê bajrê Ciwanroyê de bi Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê re ragihandiye ku, roja Yekşemî yek ji nerizayetiyan wî bajarî bi navê "Mobîn Ebdûlahî" yê temen 26 salî, û xelkê gundê "Şiwankare" a ser bi bajarê Rewanserê, bi gulereşandina rasteraşt a hêzên hikûmetê di meydana Besicî ya bajarê Ciwanroyê de canê xwe ji dest da. Hêzên Spaha Pasdaran û hêzên ewlehî yên hikûmet



di tev bajarên Kurdiştanê de cihgirbûne û di piraniya bajaran de, hikûmet nizamî ragihandine.

## Şoreşa gelên Îranê wê serkeve



N: Nûredîn Sofzade

Encama 40 sal stema sîstematîk ji aliyê rejîma dijîmirov û paşvero ya Îslamî di Îranê de, her ev encama ye ku xelkê Îranê mixabin her di deşpêka hatina ser kar ya vê rejîmê de, ber çavê xwe dîtin, lê mixabin direng nas kirin, yan hay lê bûn.

Hevdem bi keyfxweşî ve neteweya Kurd berevajiyê hemû xelkê Îranê, her di yekem rojên deşpêka karê vê rejîmê de haydarê naveroka paşvero û dîktator û dijîmirov bû. Eva ku 40 salan berî niha gelê Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê gihîşte encama vê, û ev rejîme nas kir, taze xelkê Îranê dibêjin û piştraşt dikin.

Renge kîn û dujminayetiya bê qas û sînora a vê rejîmê li dijî netawa Kurd jî, sebeb her ew be ku Kurdan berî hemû kesê ew rejîme nas kirin û serê xwe jê re netewandin, her lewra eva deştê vê rejîmê jî hatibe li dijî gelê me kiriye, da ku bikare gelê Kurd bêxe qedeman.

Fermana fitwa ya cîhada Kurdqiranê ya Xomêynî, êrîş bo ser Kurdiştanê û kêşana dehan hezar leşkerên cehl û nezan, barandina agir û asin bi ser Kurd û Kurdiştanê, û kuştina bi kom a xelkê sivil ên Kurdiştanê bi jin û zarokan û xort û kalan, kavilkirina bajar û gundên Kurdiştanê, şehîdkirina dehan hezar xelkê bê berevan yê Kurdiştanê û hezaran pêşmerge mîrxas, yekemîn bersiva rejîma dijî Kurd a Îslamî bû.

Di heyamê wan 40 salan de hevdem di Îranê de jî, para xelkê malwêranî, şer, girtin,



kuştin, heps, îşkence, derbiderî, betalî, bîrsîtî, û... hwd bûye.

Hêdî-hêdî ku xelkê Îranê û di çend qonaxan de dixwaştin li dijî vê rejîmê derkevin, deshilatdarên cinayetkar ên vê rejîma kevneperest bi mebesta xapandina xelkê ku gotina parek ji deshilatdaran hatine ser wê baweriyê ku dibe guhartinê di nava rejîmê de çêbikin, erkê xwe parve dikirin ku mixabin bo heyamê nêzîkî 20 salan jî bi vî awayî karîna kum bidine serê xelkê û hêviyekê bêxine dilê xelkê ku renge wisa be, û hemû carê bazara maşkanê ya rejîmê ya bi nav hilbijartinê gerim dikirin.

Mixabin di nava gelê Kurd de jî hebûn û peyda dibûn ku pê diholana guhartinxwaziya rejîmê direqisîn û cehd dikirin ku xelkê bo aliyê rejîmê rakêşin.

Bêguman ew qonaxa xelk xapîniyê jî derbas bû, û naveroka tewawiyeta rejîmê û yekdeştiya vê bo hemû xelkê Îranê û cîhanê îsbat bû. Hevdem digel vê rewşa navxweyî ya Îranê ku rejîmê aniye pêş, li derveyî welat jî rejîm kete berfirehtirkirina Îdolojîya kevneşopane ya xwe û

deştewerdana di nav karûbarê welatên deverê. Rejîmê li jêr navê şandina Şoreşa Îslamî bo hemû cîhanê, dehan taqim û girûpên terorîstî çêkirin ku bi çek û diravê Îranê hatine teyarkirin. Her salê bi milyardan Dolarî ji serweta xelkê Îranê xercê karên xwe ên terorîstî dikirin. Li parek ji welatên wekî Îraq, Lubnan, Fîlîstîn, Yemen û Sûriyê de ku parek ji kesên girêdayî Tehranê li ser kar bûn, ji rêka wan ve şewaza birêvebirina wan welatan û astê dîktatoriye wekî ya nav Îranê lêkiriye. Bi kurtî derencam û lêkewtên 40 sal dîktatoriya vê rejîmê, hem bo xelkê Îranê û hem bo xelkê welatên deverê, pir xisar û dijvar bûn. Lewma îro rojê em dibînin hevdem digel xelkê Îranê, xelkê welatên Îraq û Lubnan û Yemenê jî li dijî deşhilat û nifûza vê rejîmê serhildan kirine, di wan welatan de xelk dixwaze deştê Komara Îslamî di welatê xwe de kurt bike, di Îranê de jî vê carê berevajîya hemû carê xelkê serhildan li dijî tewawiyeta vê rejîmê deşt pêkirine.

Îro rojê xelkê Îranê rabûne ser xwe ku vê rejîmê sernixûn bikin, vê carê alîgirî ji parek ji deshilatdaran û li dijî pereke din nîne, vê carê xelkê

serhildayî yê Îranê li dijî hemû rejîmê rabûne ser xwe. Her lewma ye ku di hember de jî rejîm bi hemû hêza xwe û her li yekem roja serhildanê ve, bi awayî hovane kuştar bi rê xist û xwîn li ser kolanan diherike. Zêdebarî qutkirina internetê, xelk berdeham e li ser şoreşa xwe. Ew çend roj in rejîm bi çekên girane şer û êrîşê ser xwenîşanderan dike. Heta niha sedan kes şehîd kirine, hezaran kes birîndar in û hezaran kesên din jî binçav kirine. Mixabin dîsan rejîmê di kuştara Kurdiştanê de li çav seraserê Îranê rekord şikand. Piraniya şehîd û birîndaran di Kurdiştanê de ne. Eva jî careke din astê dujminkariya rejîmê digel xelkê Kurdiştanê dide xuyakirin. Di vê tevgera li dijî rejîma dijîmirov a Îslamî de, ku hevdem li Îran û Îraq û Lubnan û Yemenê deşt pê kiriye, bê guman peyama û zenga dawîpêhatina temenê rejîma terorîst a Komara Îslamî digel de ye.

Bê guman ew dengê li dijî tewawiyeta rejîmê ku vê carê bilind bûyî, taze mat nabe û rejîm ji kendalê sernixûniyê nêzîk bûye, û gelek nakêşe ku bi nemana vê rejîma dîktator, xelkê Îranê û devera Rojhilata Navîn wê tenahî û xweşiyê bi xwe ve bibînin.

**Nerîna Lîderan**



**Hesên Şerefî:**

“Em vê hereketa xelkê bi rewşa dîzayînî”.



**Pervîn Buldan:**

“Me destkevtiyên xwe bi nirxê mezînan bide xistin, em dest ji wan bernadin”.



**Mike Pence:**

“Gelê Amerîkayê piştevanê gelên Îranê ye”.



**Elî Xameneî:**

“Em piştevaniya bilindbûna nirxa benzîna dikin, û xelkê nerazî jî wekî dujminên Îranê dizanin”.

**Ji ber faşizma Fars bi hezaran mamosteyên Kurd ji kar têne dûrxistin**



**N: Eskender Ceiferî**

Wezareta Perwerde ya Îranê di biryarnamê de ku ji bo tevahiya rêveberiyên vî wezaretê li navçeyên cuda ên Îranê şandiniye, dixwaze êdî tenê ew kesên ku dikarin weke zimanê dayîkê bi Farsî bipeyvin bi belgeyên pêwîst ên pîsporiya xwe weke mamoste bêne wergirtin.

Tiştê balkêş ev e ku heya niha jî ew biryarnamê li ser malpera fermî a vî wezaretê derneketiye lê belê malperên nêzîkî Sipaha terorîstî a Pasdaran ji bo cara yekemîn biryarnamê belav kirin û bûne parêzvanên wê û gotar û raportan li hemberî rexnegirên biryarnamê belav dikin.

Eger biryarnamê bê bicîkirin, bi hezaran mamoste li Kurdiştanê ji kar têne dûrxistin. Ne tenê li Kurdiştanê, Belûciştan, Azerbaycan û Luriştan û herwisa di nav Erebên Îranê de jî gelek mamoste hene ku nikarin zimanê Farsî weke zimanê dayîkê baş bipeyvin.

Ev biryarnamê, gelek ji xalên Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan binpê dike ku Îranê jî li ser wê wajo kiriye.

Di biryarnamê de gelek xalên din jî hene ku rexnegirên wan jî dengên xwe bilind dikin. Lê ya girîng ev e ku çawan mijara ziman, li cem wan xalan hatine destnîşankirin. Vî wezaretê, cigarekêş, nexweşên felec angu astengdar û kesên ku Farsî baş nizanin danîne cem hev û ragihandiyê êdî kesê ku ji van tiştan dûr nebe nikare bibe mamoste.

Hin ji rexnegirên vî biryarnamê dibêjin gelo mirov bixwe dikarin bi xwastina



xwe ji nexweşiyên dûr bin? Çima Wezareta Perwerde daxwazê dike kesê ku dixwaze bibe mamoste, ji van tiştan bi dûr be?!

Seîd Pêwendî ku civaknas e, di vî derbarê de dibêje ev biryarnamê dikare valahiyeke mezînan di nav refên wezaretê Perwerde de çê bike ji ber ku êdî asta zanyariyan nabe îdeala wergirtina mamosteyên nû. Eger ev plan bê bicîkirin, dîroka Îranê raştî şaşî û binpêkariyeke mezînan tê. Ne xuya ye gelo her yek ji nexweşiyên weke gurçikan, bi çî rengî dikarin bandorê bikin ser piroseya xwendinê. Herwisa ji bo jinan jî hatiye tekezirin ku nabe mûyên serûçavên wan zêde bin lê dîsa jî nayê zanîn ka gelo eger mûyên serûçavan zêde bin lê belgeyên wan ên di vî warî de têrê bikin, çima piroseya xwandinê bi hebûna mûyên zêde di serûçavên jinan de astengiyan çê dike?!

Umêd Mêmariyan rojnamevanekî serbixwe ye û di derbarê redkirina daxwaza mamostetiya felec û kemandaman de dibêje heke Stêfan Hawkîngz fîzîkzanê naskirî li Îranê bûya, nedikarî jî filtera mamostetiya wezaretê Perwerde derbas bibe. Bi vî rengî wê mejiyê gelek ji zanayên Îranî jî civakê bêpar bimîne û tenê kesê ku astengdar nebe, derfeta pêşketinê dibîne.

Mihemed Emînî çalakvanê mafên mirovan jî dijatiya xwe li hemberî vî biryarnamê tîne ziman û dibêje bandora rewşa tendirustiyê û çawaniya axaftina bi Farsî qet bandorê nakin ser piroseya xwandinê û fêrkariyê ji ber ku ne kes li gor xwas-

tin û heza xwe nexweş dibe û ne jî cudahiyeke di navbera fêrkariya mamosteyekî Fars û yekî nefars de heye. Ev biryarnamê, mafên welatîbûnê binpê dike û eger serokkomar û kabîneya wî re li ber bicîkirina vî negirin, divê dadgeheke serbixwe biryarê li ser mijarê bide. Ji ber ku bi hezaran kes bêyî hebûna ti sedemeke mentiqî ji pêşketinê bêpar dibin û ji civakê jî têne dûrxistin.

Eger biryarnamê bê bicîkirin, bi rengekî yasayî, welatîyên nefars ji beşdarî di civakê de bêpar dibin û li ser vî mijarê, Elî Qazîzade rojnamevanê nêzîkî dewletê ku bixwe Kurd e jî, dide xuyakirin eger pêşiya biryarnamê neyê girtin, Rûhanî û reformxwaz, hemû alîgirên xwe ji dest didin.

Hesên Rûhanî berî ku ji bo cara duyem bibe serokkomar, gelaleyek ji bo parastina mafên welatîyan belav kir ku heya niha jî ti yek ji xalên wê nehatine bicîkirin. Piştî derketina vî biryarnamê Wezareta Perwerde, ji Şehînduxt Molawêrdî alîkara serokkomar di warê mafên welatîyan de hatiye xwastin ku ji bo rêgirtinê jî bicîkirina vî biryarnamê tevbigere. Dehan welatîyan jî wê re di Twitterê de nivîsîne da ku hewla xwe bide rê li ber vî biryarnamê bê girtin. Wê di bersiva wan de ragihandiyê ku ew raşt dibêjin û wê kabîneya wan, mijarê bişopîne û encaman ragihîne.

Beriya niha Mihemed Bethayî di kabîneya 12mîn a dewletê de wezîrê Perwerde bû û ev biryarnamê derxistibû.

## Berxwedana PDKÎ azadî û jiyan e



N: Bûbê Eser

Ez berxwedan û tekoşîna PDKÎ li Rojhilata Kurdistanê pîroz dikim. Bi hêviya ev berxwedan bibe şoreşa Rojhilata Kurdistanê û bibe azadî û serxwebûna wan û me tevan kurdan. Her hebin tekoşer û pêşmergeyên qehreman yên Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê.

Divê hûn pêşmergeyên qehreman yên PDKÎ wesiyeta Pêşwayê xwe nemir Qazî Mihemed bînin cih. Kurdistan xwe azad bikin, alaya rengîn li seranserê Rojhilata Kurdistanê hildin. Bila çiya, bajar û hemî deverên Kurdistanê bi alaya rengîn bixemile.

Tekoşîn û berxwedana we ya ji sala 1946-an û heta niha divê êdî berhem bide. Ji wê rojê û heta niha ve bê hejmar we bedel daye. Bedela vê jî divê Kurdistanê azad û serbixwe be.



Me heta niha dît, temaşe kir û bûn şahidê vê yekê ku ev tekoşîna we, taliya taliyê wê me Kurdan li Rojhilata Kurdistanê bike xwedî Kurdistanê xwe.

Di van rojan da berxwedan û serîhildana we bi pêşkêşiya PDKÎ roj bi roj bi pêşve diçe. Em û hûn jî baş dizanin ku rejîma Îranê û deştilata wê, hemî çiqasî nemerd, hov û barbar in. Em dizanin ku ji bona Rojhilata Kurdistanê negihêje azadiya xwe, wan çendîn Kurd kuştine û darve kirine.

Lê taliya hemî berxwedan û tekoşînan azadiyê, ronahî ye û serxwebûn e. Loma divê ev tekoşîn û berxwedana Rojhilata Kurdistanê geştir bibe, û me bighêjîne azadiyê.

Divê vê carê hemî Kurdên li cîhanê piştgirî û alîkariya birayên xwe yên li Rojhilata Kurdistanê bikin da ku dengên wan bêtir belav bibe. Alîkarî bikin da ku wir jî bigihêje mafê xwe ê rewa. Kurdên li Ewropa divê bi alîkariya madî û me'newî û di her qada xebatê de ji bona birayên xwe bibin alîkar. Her azadiya perçeyekê ji welatê me, azadî û serxwebûna perçeyên din nêzîktir dike. Her azadiya perçeyekê, azadiya perçên din dixwe rojevê. Hemî Kurd bi saya azadiya Başûr Kurdistanê hêz û ruheke nû girtin, bi azadî û serxwebûna Rojhilata Kurdistanê wê kurd êdî bi temamî xwediyek wê hebin, û wê xurt bibin, û bi hev re ji bona perçên neazadkirî jî wê kar û

xebatê bikin.

De kerem bikim kurdno. Wî deng û berxwedana li Rojhilata Kurdistanê bilind bikin. Wî agirê ji bona azadiya Kurdistanê pê ketiye geştir bikin. Kar û xebatê bikin da ku ew agir, ew deng ew berxwedana ji bona azadiya Rojhilata Kurdistanê netemire, geştir bibe, da ku wir jî azad bibe. Bi azadiya du perçan, azadiya perçên din jî nêzîktir dibe. Roj roja berxwedan û serîhildana Kurdên Rojhilata Kurdistanê bi pêşkêşiya PDKÎ ye. Roj ew roj e divê hemî kurdên li cîhanê jî alîkarî û piştgiriya birayên xwe bikin. Kurd hemî bira ne. Welatê me yek e. Divê em perçekirina Kurdistanê ya bi deştê zorê hatiye kirinê qebûl nekin. Li kîjan perçê Kurdistanê çirûska azadiyê pê bikeve, ew dibe azadiya perçên din jî.

Îro şansek baş ketiye deştê PDKÎ ku vê berxwedanê heta azadiyê bidomînin. Ev şans û berxwedana îro wê Kurdên me yên Rojhilat ji koletiya Îranê azad bike. Firsetên weha tim nakeve deştên me de. Divê PDKÎ vê firsetê ji deşt nede. Pîroz be, berxwedana PDKÎ ya ji bona azadî û serxwebûna Rojhilata Kurdistanê.

## Nasnameya 15 kes ji şehîdên xwenîşander hate piştraştîkirin

Di xwenîşandana xelkê nerazî di bajarên Kurdistanê de, çendîn kes ji aliyê hêzên leşkerî ve hatine şehîdkirin û dehan kes jî birîndar bûne.

Piştî ku bi berdewamî li pey ketin û pêwendîgirtin digel welatîyên nerazî dli bajarên Kurdistanê de, heya niha nasnameya 15 kes li şehîdan bo Ajansa Nûçegihaniya "Kurdpa"yê, hate eşkrebûn.

Nasnameyên wan wiha ne:

Kawe Mihemedî xelkê bajarê Ciwanrio  
Mubîn Abdulahî, xelkê Ciwanro



Yûnis Huşengî, xelkê Ciwanro-

Cebar Tucare kurê Ebdulrehman, xelkê Ciwanro-

Hemze Neqdî kurê Ezîz, xelkê Ciwanro-  
Îbrahîm Muradî xelkê Ciwanro-

Îdrîs Bîware, xelkê Merîwan-

Daniyal Îstiwârî, xelkê Hanegermal ya bajarê Merîwanê

Osman Nadirî, xelkê Merîwanê-

Şaho Welîdî, xelkê Merîwan

Mêhran Tak, xelkê Merîwan-

Bêhrûz Melekî kurê Haşim, xelkê bajarê Sine û rûniştîyê Kanî Dînarî a bajarê Merîwanê-

Mizefer Zehîrî kurê Nesûr, xelkê Kirmaşan-


Şilêr Dadwend, xelka Borkanê-

Mîna Şêxî, xelka Seqizê-

Heya dema belavbûna wê nûçeyê, bi sedema qutkirina Internetê û nebûna medyayên azad di Kurdistanê de, amareke hûr û dirûst li hejmarê şehîdan û birîndaran li ber deşt nîne.



**Li qedera welatiyeke Kurd, ti zaniyariyek ji ber dest nîne**



**L**i qedera welatiyeke Kurd lya xelkê bajarê Kamyananê piştî desteserkirina wê heya niha, ti zaniyariyek ji ber dest nîne.

Pêka rapora ku gihîştiye Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, li qedera welatiyeke Kurd a xelkê bajarê Kamyananê ya bi navê “Perîsa Seyfî” ya temen 30 sale, piştî desteserkirina wê heya niha, ti zaniyariyek ji ber dest nîne.

Ew welatiya Kurd, çend roj

berê niha ji aliyê hêzên kinc şexsî yên îdara Îtîla`at ya bajarê Sinê ve, li cihê karê wê her li wî bajarî de hatibû binçavkirin, û bo cihekî nediyar veguhaştin e.

Ew welatiya Kurd di heyama desteserkirina wê de, ti peywendiyek digel malbata xwe tine bûye.

Heya dema bilavbûna wê nûçeyê, li sedema desteserkirina “Perîsa” ti zaniyariyek ji ber dest nîne.

**Tinebûna ambûlansan, di devera Mirgower de**



**D**i navenda dermanî ya devera Mirgower a ser bi bajarê Urmiye, Ambûlansên havarhatinê tinin, û eve jî pirsgirêkeke mezin bo xelkê wî deverî afirandiye.

Di navenda dermanxaneyên devera Mirgower û Deşt a ser bi bajarê Urmiyê de, tenê yek Ambûlansa havarhatinê hene, û ev herdû de Vere, ku heşîmeteke zêde hene, li yek Ambûlansê mifahê verdigrin.

Di bingkeya Rajanê de ku binkeyeke Cadeyî ye, tenê yek Ambûlanis heye û ev jî bo havarên bilez e, û di nebûna wê Ambûlansê de, hekî havareke bilez hebe,

dibe li navenda bajarê Urmiyê Ambûlans bo wan deveran bêne şandin.

Navbera Rajan heya Mirgower 20 KM e, û di devera mirgowera pir heşîmet de, hêştta jî, ambûlanis tine.

Ev mijara tinebûna Ambûlans, pirsgirêkeke mezin bo xelkê wan deveran afirandiye, û xelkê wan deveran heya niha çendîn caran di vê derheqê de nerizayetiyan xwe nîşan dane.

Berpîrsên pêwendîdar bi wê mijarê jî, her carê hêcetekê bo xelkê tîn in, û li xizmetguzariyan xwe dûr dixin.

**Raporek li derheq rewşa Mihemed Seleşûr, hepsiyê siyasî di girtîgeha Urmiyê de**

**H**epsiyekî siyasî yê Kurd, xelkê devera Mirgower, di girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê de, her di bin givaşa Saziya Îtîla`ata hikûmeta Îranê de ye.


“Mihemed( Ismet) Seleşûr”, 27 salî, kurê “Xurşîd”, girtiyê siyasî yê Kurd, di girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê de, di meha Reşeme ya sala 1396`an de, bi tometa “endametî û propagende bo yekek ji partiyên Kurd yên opozîsiyona hikûmeta Îranê”, ji aliyê hêzên îtîla`atê ve hatibû desteserkirin, û piştê di 4`ê meha Banemer a sala 1397`an, piştî 48 rojan lêpîrsîn, ji girtîgeha Îtîla`atê ve, bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê, hatibû veguhaştin.

Ew hepsiyê siyasî yê Kurd, piştî çend rojan ji veguhas-

tina wî bo girtîgeha bajarê Urmiyê, di taya 3 a dadgeha şoreş a bajarê Urmiyê de, bi dadweriya “Necefzade”, bi 8 salan hepsa te`izîrî, hatibû cizadan.

Çavkaniyekî agehdar di girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê de ragihandiye: Piştî derbasbûna 2 sal ji ser hepsa te`izîrî ya wî girtiyê siyasî ku pêwendî bi tohmata “hebûna çek”, bû, hatiye bexşîn.

Herwisa wê çavkaniyê got: “Ew girtiyê siyasî, piştî 10 mehan di girtîgehê de, bi tometa “pişikdarî li kuştina yekek ji endamên Spaha Pasdaran”, bo girtîgeha parastina Îtîla`ata Spaha Pasdaran hatibû veguhaştinê, ku di 2 qonaxan de, bo heyama 15 û 63 rojan, di oda tekekesî de mabû, û piştî îsbatnebûn wê tohmetê, dîsan bo girtîgeha



navendî ya bajarê Urmiyê, veguhaştibûn.

Herwisa wê çavkaniya daye zanîn, “ew hepsiyê siyasî yê Kurd di heyama desteserkirina wî de, raştî pirsgirêkên zaf yên malbatî bibû, û herwisa di bin givaşên Îtîla`ata hikûmeta Îranê de ye.

Ew hepsiyê siyasî yê Kurd, xwedî jin û male, û xelkê gundê “Filkan”a girêdayî devra Mirgower a bajarê Urmiyê ye.

## Behmen Qubadî: Heya sernixûniya rejîma Îslamî xwenîşandanên xwe bidomîn

**B**ehmen Qubadî, hûnermend û derhênerê naskirî yê Kurd, di peyameke kurt a vîdiyoyî de, daxwazê ji xelkê Kurdistanê dika ku, heya sernixûniya rejîma Îslamî, xwenîşandanên xwe bidomîn in.

Roja Duşemî 27`ê Xezelwerê, “Behmen Qubadî”, hûnermend û derhênerê naskirî yê Kurd, peyameke kurt a vîdiyoyî belavkiriye, û di wê peyamê de, daxwazê ji xelkê Kurdistanê dika ku, heya sernixûniya rejîma Îslamî, xwenîşandanên xwe bidomîn in.

“Behmen Qubadî” bo gelê Rojhilatê Kurdistanê dibêje: “Em wekî Kurd dibe mafê



xwe werbirgirin”.

Herwisa navbirî li ser wê mijarê tekezê dika ku, rejîma Îranê, mezintirîn dujminê gelê Kurd e, û netewa kurd teke hiviya netewên din di çarçoveya Îranê de ye.

Behmen Qubadî, di dawiya peyama xwe de, daxwazê ji Partiyên Kurda û pênûsbidestan dika ku, bi her awayekî ku bikarin, di wê serhildana xelkê de, rolekî bi bandor bilîz in.

## Kurdên Rojava ji bo kesayeta salê ya kovara “TIME” berbijêr in

**K**ovara Time ya Amerîkayê ku her sal kesayetê/a salê destnîşan kir, îsal jî navê berbijêrên ji bo kesayeta sala 2019`an belav kiriye û Kurdên Rojavayê Kurdistanê jî yek ji berbijêrên nava liştaya îsal a vê kovarê ye.

Ji bo destnîşankirina kesayetê/a sale kovara Time a amerîkî liştêk ku ji 100 berbijêran pêk hatiye belav kiriye û daxwaz ji xelkê kiriye, ku bi dengdanê kesayetê/a yekem a sala 2019 diyar bikin.

Kovara Time nivîsiye: “Divê kê bibe kesayetê/a sala 2019 a Time? Em dixwazin guhê me li we be. Deng bidin bo wî kesê yan grûpa xelkê ku mezintirîn bandor li ser bûyerên sale hebûye, êdî eger baş bûbe yan jî xirab.”

Di lišta xwe ya îsal de, kovara Time ya amerîkî Kurdên Rojavayê Kurdistanê jî weke yek ji 100 berbijêran diyar kiriye û ji bo nasandinê wêneyeke şervanên HSDê belav kiriye.

Di nava berbijêran de herwiha Serokomarê Tirkîyê Re-



cep Tayyip Erdogan jî heye ku bi biryara wî artêşa Tirkîyê tevî grûpên cîhadî yên tundrew êrîşî Rojavayê Kurdistanê kiriye.

Herwiha navê serkirdeyên din ên cîhanê yên weke, Serokê Amerîkayê Donald Trump, Serokwezîrê Kenedayê Justin Trudeau, Serokê Fransayê Emmanuel Macron, Şewirmenda Almanayê Angela Merkel, Rêberê Komara Îslamiya Îranê Elî Xaminêyî û Serokê Çînê di liştêyê de ye.

Tevî wan kesayetan, navê çend grûpên cîhanî jî di nava berbijêrên Time de ne, ku ji wan jî koçber, xwepêşanderên ji bo paraştina keşûhewayê, xwepêşanderên Honkong û çend komên din hene.

Time dibêje, di hefteya yekem a meha bihê de serkevtiya rapirsîyê dê were ragihandin û roja 11ê meha Kanûnê jî dê kesayetê/a salê eşkere bikin.

## Zimanê Kurdî

Reseniya van hevokan jî ev e : - Ev hespê ku diçêre (hespê) min e - Ev mehîna ku diçêre (mehîna) min e - Ev hesp û mehînen ku diçêrin (hesp û

mehînen) min in .

Lê ji bo ku ev nav (hesp, mehîn, hesp û mehîn) dúbare nebin hatine avêtin û zêderên wan (ê, a, ên) cihê wan girtiye . Bo vê cîgirtinê jî, navê (cînavên heyî, arzî, peywendî) li van zêderan bûye .

3- Vêca ku ev zêder (ê, a, ên) bi tena xwe li pêş cînavê girêkî “ku” bikar bînin, hingê weku cînavên pêywendî (arzî) têne nasîn, ne ku parçeyek ji cînavê girêkî ne .

Wek : - Ê ku helbestan dixwîne birayê min e - A ku helbestan dixwîne xuşka te ye - Ên ku helbestan dixwînin hevalên me ne

Cînavê “ku” bêjeyê neguhêrbar e, di hemû dem û raweyên hevokan de wekî xwe dimînin. Nîşandekên zayend û jimaran jî lê xuya nabin û li gora navê berî xwe (bê guherîn) tê xebitandin.

Wek : - Ev doşt bû, yê ku alîkariya min kir - Ev doşt bû, ya ku alîkariya te kir - Ev doşt bûn, yê ku alîkariya me kir

Bikaranîna cînavê girêkî “ku”, di pêvajoya gotina watedar de, (2) hevokên hevtêkel û pevgirêdayî saz dibe : 1-Hevokê sereke yê tevayî, ku ji hemû bêjeyên komika gotinê (qisekirinê) pêk tê . 2-Hevokê biçûk î girêkî, ku ji cînavê “ku” û kar û pêgirên wî, di hundirê hevoka sereke ya tevayî de Wek : - Miletê (ku zimanê xwe neparêze) kesatiya xwe bertalan dibe . - Serê (ku ne-êşe) paçan lê negerîne . - Çala (ku tu avê jê vedixwî) keviran tê werneke

Her mînakek ji van mînakan bi(2)hevokan pêk

hatiye :

1- Hevoka sereke ya ku ji tevaya komika mînakê saz bûye . Anku, her mînakek hevokê sereke ye.

2- Hevoka biçûk, a ku di navbera kevankan de ji cînavê “ku” û pêgirên wî saz bûye . Ev hevoka ku bi cînavê “ku” saz dibe, hevokê girêkî ye. Berçav e, ku her dû hevok (ya sereke û ya girêkî), ji hêla bêje û wateyê ve jî, bi hev girêdayî ne . Cînavê “ku” di hevoka xwe, ya girêkî de dibe kara û berkar .

Nimûne : - Kara : - Mirovê (ku tu birî malê) hevalê min bû . Anku, (wî tu birî malê) . - Berkar : -Mirovê (ku te bir malê) hevalê min bû

Anku, (te ew bir malê)

Diyar e, ku ev cînavê girêkî “ku” di hevoka xwe de serbixwe ye, dibe kara û dibe berkar jî . Lê ji hêleke dîtir, girêdaneke tund di navbera vî cînavî û navê berî wî de heye . Vêca pirs ev e : Gelo ew girêdan çî ye ?! Ji hemû mînakên derbasbûyî tê nasîn ku cînavê “ku” digel hevoka xwe ya girêkî cihê hevalnavekî (rewşekê, rengdêrekî) digre. Ev hevalnav bi navê berî cînavê “ku” ve girêdayî ye . Anku, hevoka girêkî dibe hevalnavê navê berî “ku” . Wek : - Dijminê (ku xwîna gelan dimije) gerek nemîne . - Ew kesê ( ku hatiye kuştin) diz bû .

Di van mînakan de cînavê “ku” tev hevoka xwe, cihê hevalnavekî digre . Li vê gorê - ew mînakên jorîn dibin : - Dijminê (ku xwîna gelan dimije) gerek nemîne. [ Dijminê (xwînmij) gerek nemîne ] . - Ew kesê ( ku hatiye kuştin) diz bû . [ Ew kesê (kuştî) diz bû] .

Berçav e, ku ev her dû hevalnav (xwînmij, kuştî) bi navên (dijmin, kes) ve têne girêdan û dibin hevalnavên wan . Ji bilî vê “ku” ya cînav (2) “ku” yê dîtir jî hene. Pêdivî ye ku em wan jî binasin, da ku em karibin wan ji hev cuda bikin .

1 -(Ku) ya Alava Mercî :

Ev “ku” bi wateya (heger, eger, heke) bikar tê. Wek : - Ku ez vegeyriyam ez ê te bibînim - Ku birayê te li malê be, bila bê dibîstanê . - Ku bayê te rabû zebeşan li ber bidêre . ( gotina

pêşyan)

2- (Ku) ya Alava Girêkî :

Ev “ku” alaveke girêkî ye, peyvên berî xwe bi yê paş xwe ve girê dide û bi vê girêdanê wateya hevokê sergihayî dibe. Ev alava girêkî li pey karan (kirinan) tê xebitandin û egera bûyîna wan karan ronî dibe . Wek : - Ez hatim ku te bibînim . - Min xweşt ku ez we nas bikim . - Azad hewl dide ku xwe bighîne hevalan .

Ji hêleke dîtir, ev alava girêkî digel karê li pey xwe dibe weku navekî (jêderekê) û cihê berkarê nerasteder digre : - Berî ku ez te bibînim min xwe amade kiribû . ( Berî dîtina te min xwe amade kiribû) . - Piştî ku em karê xwe bikin em ê vehesin ( Piştî kirina karê xwe em ê vehesin)

**Dom heye...**

# Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ [www.Kurdistanmedia.com](http://www.Kurdistanmedia.com)
- ◆ [www.Agirimedia.org](http://www.Agirimedia.org)
- ◆ [rojnamaagiri@gmail.com](mailto:rojnamaagiri@gmail.com)
- ◆ [www.facebook.com/Agirikirmanji](https://www.facebook.com/Agirikirmanji)

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (362)

## Wêneyên xwenîşandanên xelkê nerazî yê Rojhilatê Kurdistanê

